Serê sibê dengê çûkan

LIDA Portugal

Vilius Aistis Vilimas

Hebûn Stembar

5

کورمانجی kmr

Yulia, mêrê wê û keça wan a piçûk li Ukraynayê li gundek piçûk a bêdeng dijiyan. Yulia hez dikir ku her sibe bi dengê çûkan şiyar bibe. Qet nedifikirî ku ewê ji malê dûr bijî, an jî sibê bi dengê çûkan ranebe.

Mêrê wê her gav gazinc dikir ku têra xwe pereyê wî tune ye û bi giranî dest bi vexwarinê kir. Wan biryar da ku şensê xwe li Portekîzê biceribînin. Dibe ku ji bo avakirina xaniyek li wir û avakirina paşerojeke baştir ji bo malbatên xwe bikarin zêdetir pere qezenc bikin.

Yulia pişti ku bi serfirazî li mala xwe ya nû bi cih bû dest bi kar kir wekî paqijker. Xebata wê ya bi xîret û tevgera wê ya bi rûmet ji hêla xerîdarên wê ve pir hate pejirandin. Ji aliyê din ve, mêrê wê dest pê kir ku her ku diçe xwe jê derdixe. Ji ber pirsgirêka wî ya vexwarinê, karsaz ji wî bawer nedikirin û ji wî re kar nedikirin.

Rojekê wî dest bi qîrîna Yulia kir. Dû re wî dest bi lêdana wê kir. Bi taybetî dema serxweşiyê qêrîn û lêdan zêdetir dibû. Yulia ji bo xwe û keça xwe ditirsiya, lê wê nizanibû ku çi bike.

Dema ku Yulia di dawiyê de neçar ma ku bi destê şikestî biçe oda lezgîn a nexweşxaneyê, wan jê re got ku şîdeta nav malê li Portekîzê pirsgirêkek mezin e. Wan jî got ku ew sûc e û divê ji polîs re ragihînin.

Yulia westiyabû û bi fikar bû ku keça wê ya piçûk her roj li malê şîdetê bibîne. Yulia fêhm kir ku destdirêjî her dem hebû, her çend ew xwe bi awayên cûrbecûr diyar kir.

Yulia çû stargeheke jinan, li wir xwe ji her gavê bêtir ewle hîs kir. Ji dema ku serê sibê bi dengê çûkan ji xew şiyar dibû û heta niha, wê wisa hîs nekiribû.

LIDA Stories

lidastories.net

Serê sibê dengê çûkan

LIDA Portugal
Vilius Aistis Vilimas
Hebûn Stembar

CC BY